

Dûrxistina hejmareke navçeyên Kurdistana Sûriyê ji sizayan baş e, lê heger sûd jê were wergirtin

Kurdistan



Wezaretê Gencîneya Emerîka hejmareke navçeyên li Sûriyê ji çarçoveya sizaya Qeyser derdixê, û ji wan Kurdistana Sûriyê. Nûnerê berê yê Emerîka li Sûriyê Joel Rayburn ragehand, ev biryar zehmet e li ser

erdê were cîbicîkirin, lê derfeteke baş e ji bo vegera jiyana normal ji wan deveran re, herwiha pêwîste rejîma Esed sûdê ji vê biryarê bi ti awayî nebîne. Ji aliyê xwe Serokomarê Tirkiyê Receb Tayib Erdogan got ew vê biryara şaş ya

Emerîka qebûl nakin, û ew li hêviya daxuyaniya Serokê Emerîka Joe Biden di vê derbarê de ne heta bi fermî helwesta xwe eşkere bikin, Erdogan gefa operasyoneke nû li Sûriyê xwar. Ev biryara Wezaretê Gencîneya Emerîka karvedanên

zêde li pey xwe ve anî. Welatiyek dibêje bawer nakim ti sûda vê biryarê ji bo xelkê hebe, û dê berpîrsên PYD û PKK sûdekê jê bibînin. Pisporekî abûrî jî dibêje, zehmet e li ser erdê ev biryar were cîbicîkirin, lê di hin waran de serkeftî

be mîna pêşxistina kerta petrol, piraniya kelûpel û madeyên sereke heta niha ji Şamê û bajarên din yê Sûriyê têne deverên me, wê demê dê li wir jî buha be, herwiha danûstandin heta niha jî bi Lîreya Sûrî ye.

Armanç ji berdana girtiyan veşartina komkujiya Tadamun bû

Kurdistan-
Mihemed Ehmed

Roja 30ê Nîsana derbasbûyî Serokê rejîma Sûriyê Beşar El-Esed, bi fermaneke komarî biryara lêborînê ji bo girtiyan bi tohmata terorê hatine girtin, derxistibû. Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragihand, di çarçoveya proseya azadkirina girtiyan de, dezgehên ewlekarî yên rejîmê proseya azadkirina girtiyan berdewam dikin û hejmara kesên hatine azadkirin ji hemû parêzgehên Sûriyê gihîştîye zêdetirî kesan. Ew girtî di salên borî yên şerê navxweyî yê Sûriyê de bi tohmata terorê hatibûn girtin. Li gor Rewangehê, hejmara kesên hatine azadkirin bi berawirdkirina kesên hatine girtin re, geleki kêm e ku tevî derketina biryara lêborînê ji çend rojan ve, ti amareke fermî derbarê kesên hatine berdan yan kesên dê bêne berdan de nedaye. Lêborîna îdiakirî hêviyên Sûriyan ji bo hevdîtina bi xizmên xwe re zindî kir, piştî ku hema hema di hesabên wan de hat jibîrkirin, bi taybet piştî aşkerekûna komkujiya li taxa Tadamon a Şamê ya di sala 2013'an de hatibû kirin. Rewşa girtiyan hatine azadkirin û wêneyên wan ên li ser malperên çalakvanên Sûrî hatine belavkirin, çîrokên xemgîn li ser salên derbasbûyî di zindanên nihênî yên rejîma Sûriyê de vedibêjin û rûyê wan yê westayî trajediya berdewam nişan dide. Li gor amarên Rewangehê, ji destpêka krîza Sûriyê di meha Adara 2011an û heta niha, zêdetir ji 969 hezar kes ji aliyê dezgehên rejîma Sûriyê ve hatine girtin, di nava wan de zêdetir ji 152 hezaran jin in. Herwiha zêdetir ji 105 hezar girtiyan jî di bin eşkenceyê de hatine

kuştin, di nava wan zêdetir ji 41 hezaran jin in.

Wezaretê Derve ya Amerîka derbarê serbestberdana girtiyan ji aliyê rejîma Esed ve ragehand, ku wan ew raport dîtine ku behsa serbestberdana girtiyan li Sûriyê dikin kirinê li heta niha rejîma Esed berpirse di ber mirin û zehmetiya xelkê Sûriyê de ku nivê xelkê Sûriyê penaber û koçber bûne, û rastî girtin û eşkenceyê

hatine. Herwiha Wezaretê tekez kir ku heta niha Amerîka pabend e bi giringiya lêpîrsînê derbarê van tawanên şer ku dijî xelkê Sûriyê pêk hatiye. Ji aliyê xwe ve, Şanserê Navdewletî ji bo pîrsa Sûriyê Geir Pedersen ragehandibû, kiriyara serbestberdana girtiyan pêngaveke baş û giring bû, û ewê ji bo vê mebestê jî sardana Sûriyê bike. Welatîyek derbarê mijara serbestberdana girtiyan dibêje, bi rastî piştî vê

biryarê min nih zanîn ewqas girtiyan Kurd li nava zindanên Esed hene, ti aliyekî kar li ser pîrsa girtiyan nekiribû û tenê çend navên diyar hebûn ku berdewam dihatin behskirin. Piraniyê ewên hatin berdan nexweş û kêmendam bûne, û rewşa tendirustiya wan jî geleki xerabe, lewma pêwîste karekî zêdetir ji bo vê pîrsê were kirin û bi taybet navên tevahiya girtî û windabûyên Kurd werin belgehkirin, û

li navendên cîhanî ew nav werin pêşkêşkirin. Welatîyekî din dibêje, dema serbestberdana van girtiyan ne ji valahiyekê hatiye, û ev yek tenê ji bo veşartina komkujiya Tadamunê ku ji aliyê çekdarên rejîma Esed ve hatibû encamdan, bi vê biryarê rejîma Esed raya giştî ya Sûriyê û derve jî dûrî vê pîrsê kir, û bi rsatî heta astekê ev yek pêk hat û rejîmê xw eji vê pîrsê dûr xist.



Serkirdeyekî PKK

Siyaseta Ocalan bi Rengê reş di nerxîne



Mahir Hesen

Di geşedanên kongirê duyem de nîşan da ku Ocalan xwe weke tevahiya PKK'ê dibîne û her tiştî li gorî wî dibe plan bibe. Êdî pêdiviya wî bi têkiliya a rêhevalan bi hev re nema. Xwe xwediyê li saziya rêbertiyê didît. Balkêşî ne li ser partî û armanca têkoşinê ye, li ser xwe ye. Ev yek Serkirdeyekî PKK Îbrahîm Aydın di pirtûka xwe a Vengma de teqes kiriye.

Îbrahîm Aydın gelo kî ye ?!
Îbrahîm Aydın yek ji endamên PKK'ê yên herî kevnar e. Di sala 1972'an de bi Ebdullah Ocalan re li Enqereyê hat girtin. Hakî Karer, Kemal Pîr û şoreşgerên din ên Kurdistanê li mala Ocalan bi Ocalan re hevdîtin pêk anîn. Îbrahîm ji Enqereyê diçe Dîlokê, li Enstîtuya Perwerdehiyê mamosteyan û beşdarî xebatên rêxistinkirina koma şoreşgerên Kurdistanê dibe. Piştîre ji Dîlokê diçe Amedê. Li gel her yek ji parêzer Mahmut Bilgili û Selîm Çürükkaya dimîne. Dema di şaredariya Amedê de dixebitî xebatên xwe yên rêxistinî didomand û beriya buyera 12'ê Îlonê derket derve. Demek dirêj li Şamê dimîne. Weke koordînatorekî PKK'ê li Ewropayê tevdiqere û ji Ewropayê di ser Şamê re derbasî Başûrê Kurdistanê dibe. Li vir ji PKK'ê derket û xwe spart PDK'ê. Îbrahîm Aydın heta salên

1980 - 1985'an di nava PKK'ê de bû bi hemû hûrgiliyan dizane. Dema ku hûn pirtûkê bixwînin, bê guman hûn ê gelek tiştên ku we heta nuha nizanibûn bizanibin. Wek tê zanîn PKK xwedî dîrokeke ji derewan. Ezê tenê li ser beşek ji pirtûka Îbrahîm Aydın bi axivim û nerîna wî li ser Ocalan û zanyarên li paşperdeyê weku di pirtûka xwe de nivîsandîye ji bo xelkê me raxim: Wek Îbrahîm dide diyar ku Ocalan serokatiya xwe û rêbertiyê li pêş sazûmaniyê dixê. Ji ber ku hemû navendên desthilatdariyê di destên xwe de kom kiribû, nasnameya xwe ya rastîn di Kongirê duyem de eşkere dikir. Bi Îdeolojiyek ku sedema hebûna Gelê Kurd û PKK bi xwe ve girê bide, yan jî jiyan bi wî dibe yan jî tune ye. Dezgehên sazî li gor Ocalan nabin, her biryar dibe ku ji ba Ocalan be û nabe tu sazî bêne damezrandin û bibin xwedî biryar. Ocalan di hevpeyvîna bi serokê rêxistina Kurtuluş Mahir Sayin re van Ramanan bi rengekî dûr, şik û gumana xwe ji peyva "saziyê" tîne ziman. Wisa dibêje: "Tu dibêjî saziyek, li şûna hebûna saziyekê, divê zêde bawerî pê neyê..... Saziyên me jî hene, ez wan zêde ciddî nagirim.... Tu dibêjî qey ji fermanarên ku di dîrokê de pir bi bandor bûne xwedî partî, kîjan sazî heye? Tu dibêjî qey ew heye, rast e, ew çep e." Bi Ocalan jî bawerî bi partiya xwe nayê. Bêbaweriya xwe bi neçûna Başûrê Kurdistanê nîşan da, tevî ku dema ji Sûriyê derket ji aliyê partiyê ve hatibû vexwendin jî, rojekê jî lingê xwe neavêt van xaka Başûr û tenê bi peyamên dûr beşdarî kongirê û konferans û civînan bû.


Ji beylî tunekirina

saziyên, Ocalan axivtina serkirdeyekî PKKê jî her wisa pûç dikirin. Di civîna û civînan de Ocalan li ser mijarên bîrdozî, siyasî û leşkerî di axivî. Ji xeynê vê, nîrxandinên pir giştî li ser hin kêmasiyan dikir. Wî axaftinên xwe de tu kes bi lêvnedikir. Wî ev kar radestî çend pêxwasên din kir bû. Mînak dema Saîme Aşkin, diyar kir ku li Lubnanê û Sûriyeyê hevalên keç ji xwendinê tîne dîrxistin û ji bo sererastkirina vê helwestê axivî. Dûran Kalkan ê ku ti tişt jî wî nedihat xwestin jî bersiv da, û dest bi axaftinê kir ku hevalên xwe yên keç kirin armanc.

Kesên ku di Rêbertiyê de yên nema dikarin Ocalan bişopînin weke "xayin û sîxur" hatin tewanbarkirin, û bi taybetî kadroyên ku pirsîyar dikirin û hewl didan analîz bikin. Ji aliyê din ve, wî komîteyek navendî dixwest ku pêk bîne, ne ku hizir bike. Tenê gotina Ocalan bi darê zorê bimeşîne. Mafê kadroyên PKK tunebû û tune ye ku bifikirin... Bi van rêbazan tevahî Konseya PKK'ê hate damezrandin. Dosyaya kongreyê PKKê radestî Ocalan hat kirin, tevî protokola 15 navên ji bo hîlbijartina Encumena Rêveber hatibûn nivîsandin. Di daxuyaniyê de Abdullah Ocalan, Duran Kalkan, Cemîl Bayik(Cuma), Alî Haydar Kaytan, Îbrahîm Aydın, Alî Çetîner, Çetîn Gungor, Kesîre Yildirim, Mehmet Karasungur, Mahsun Korkmaz, Selahattîn Çelik endamên sereke, Îsmet Dogru, Alî Ozansoy. Omürçan (Terzî Cemal) daxuyand ku ew wek endamên cîgir hatin hîlbijartin. Mehmet Karasungur û Mahzun Korkmaz ên ku di listeya Encumen'ê de cih girtin, ji ber ku li

Başûrê Kurdistanê bûn û Alî Omürçan di qada perwerdehiya taybet a ji 25 kesan pêk dihat, nekarîna beşdarî kongirê PKK yê duyem bibin. Çetîn Gungor, Îsmet Dogru, S. Karakuş, Şenay, Saîme Aşkin, Selman Omürçan, Evîn (kod) û çend hevalên wan yên din ku navê wan nayê zanîn, di lêkolînên ewropî de bûn. Ji aliyê din ve Îbrahîm hat wezîfedarkirin ku di encama şer û pevçûnên nava Îsraîl û Lubnanê de, PKK vekişîna wan li herêmê ber bi Sûriyeyê ve biçê. Îbrahîm ev heval li Heleb, Efrîn û Kobanê bi cih kirin û li wir perwerdeya xwe ya siyasî û leşkerî domand. Li Helebê keçên nav PKKê de di malek bi kirê de bûn, li derdora Efrînê nêzî bîst kadroyên PKK di maleke mezin de hatin bicihkirin. Berpirsiyariya vê komê dabûn Alî Ozansoy. Bi heman awayî di bin berpirsiyariya Murad Karayilan de derbasî Kobanî bûn. Bi plan bû ku Karayilan li vir bû. Serpêhatiyên xwe ji Endamên PKKê re digotin û bi taybetî yên di warê qaçaqxçîtiyê de yê li ser sînorê bakûr û rojavayê Kurdistanê ku wî baş nas dikir. Ev yek jî Îbrahîm di pirtûka xwe de teqes kiriye û berdewamî di axive û dibêje dema ku Murad Karayilan (Cemal) ew bir mala ku lê diman, wî dît ku ode tijî mayinên teqemenî ye. Wî PKK hînî rakirina Mayinan dikir û ji bo ewlekarî û bikaranîna zeviyên mayinkirî berpirsiyar bû. Îbrahîm diyar dike çawa hewl dane ku ciwanên Kurdistanê Sûrî jî tevî van çalakiyan bikin. Di vî warî de PKKê piştgirîyeke mezin ji Kurdên li Rojava dît. Di rojên dawî yên Nîsana 1983an de dema ku Îbrahîm Aydın ji Kobanî vedigeriya Helebê, Cemîl Bayik (Cuma) ku ji Şamê hatibû silav kir û


got divê ew veqere Şamê û Ocalan li benda wî ye. Dema Îbrahîm ji Cemîl Bayik pirsî ka çi bûye, got: "Çepelin, mirovên bêşeref, dema diçin Ewropayê xwe şaş dikin. Hem Semîr hem jî Şoreş li gorî mejî û şewaza jiyana xwe tevdiqerin, ne li gorî xebata rêxistinî ya partiyê." wî jimar berdewam dikir. Li ser pirsê "Çima Îbrahîm Aydın", wî bersiv da "Ew dixwaze ku hûn biçin Almanya". Destpêk û destwerdana yekem a dozên ku wê di dîroka PKK'ê de bi navê 'Bûyera Semîrê' dest pê bike. Bi vî rengî Siyaseta xwe di meşandin, çi mirovê ne li gorî nerîna Ocalan be, bi bêşerfî bête xuya kirin di nav konseya PKKê de Îbrahîm Aydın bi gotina ku ew ne alîgirê çûyînê ye, dest bi amadekariyên xwe yên ji bo prosedurên burokratîk ên pêwîst kir, çengo ev biryara partiyê bû, ew ê li gorî wê bisekine, ji ber ku bi hizirkirina ku biryarên şaş bi yekalîkirina bargiraniyê dibe. Ew ji agahiyên li ser bûyerên dîr bû û nizanibû. Ji ber vê sedemê, helwesta wî zelal dibe di pirtûka wî de di bêje: pêwîst e zîncîra bûyerên ku me û bi vî awayî partiyê gihandine qonaxêke weke bûyera Semîrê, beriya destwerdana Ewropayê, were ravekirin, da ku mijar baştir were famkirin.



Du sal bi ser koça dawî ya Hunermend Seîd Gabarî re derbas dibin

Kurdistan

Berya du salan dilê Hunermendê navdarê Kurd Seîd Gabarî rawestiya, û kesekî giranbuha jinav me bar kir, Seîd Gabarî bi dengê xwe heta niha zindî ye. Hunermendê Kurd Seîd Gabarî di 13ê Nîsana 1956an de li gundê Xirbê Kejê yê bajarê Heskê yê Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye. Seîd Gabarî di heşt saliya xwe de dest bi hunera Kurdî kiriye û



wek her Kurdekî di wî wextî de jiyana xwe di

bin zilm û zorê derbas kiriye. Di 1966an de Seîd

Gabarî helbestvanên Kurd Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj nas kirin. Herdu mamosteyan bandoreke mezin li Seîd Gabarî kir û alîkarên wî jî bûn. Di sala 1967an de xwe bi xwe hîni lîxistina tembûrê (bizqê) kir û piştî du salan, di 1969an de, konsera xwe ya pêşîn da. Di sala 1970î de ji ber straneke şoreşgerî li konsereke mezin li Qamişloke hate girtin, wî pir eşkence û zehmetên bi eş dîtin û gotinên stran û awazên Kurdî lê qedexa kirin. Lê

Seîd Gabarî xwe ti carî ji stran û awaz û gotinên Kurdî dûr nekir. Seîd Gabarî bi dehan stranên şoreşgerî û evîdarî gotin, yek ji stranên wî yên gelekî naskirî Bilbilê Dilşad e, ku seydayê Tîrêj nivîsandibû. Herwiha wekî hunermendekî şoreşger di nava şoreşên Kurdan de cih girtibû. Hunermend Seîd Gabarî ji ber zextên siyasî ew neçar ma ku derkeve Ewropa. Di van salên dawî de Seîd Gabarî gelek caran li Başûrê Kurdistanê dima.

Di meha Remezanê de ber bi diramayeke Kurdî ve

Idrîs Hiso- Gewîlan

Li Cîhana Erebi bi şeweyekî berbiçav zincîreyên dirama bi meha Remezanê ve girêdayî ne, wek nerîtiyekê lêhatiye ku bihêztirîn karên diramaya Erebi ji welatên Kendavê bo welatên Mexrîb û bitaybet welatên Erebi li Rojhilata Navîn, di meha Remezanê de tene nemayîşkirin aya Kurd ji hewildidin ku di meha Remezanê de vê valahiya ku heye dagirin?

Îsal cuda ji salên borî min beşek ji dema xwe liber diramaya Kurdî li ser tora mîdyaya civakî Yûtyûp qedand, ez hemîşe dibêjim ku zincîrediramayeke ciwan bandorê li civatê dike bêhtir ji dehan bernameyên din ku bi milyonan pare lê tene serf kirin.

Îsal berbiçav bû ku çend zincîrediramayên Kurdî hebûn, mîna Hest û Raman, Tehil û Şêrîn û Komênt û hin zincîrediramayên din. Min ji wan hemiyan Tehil û Şêrîn bo xwe hilbijart, çinko min berî niha li werzê yekem ê vê diramayê temaşekiriye, û bi min xweşbû ku temaşeyî diramayeke Kurdî ku babetên civata Kurdî bişeweyekî hunerî ciwan û bi çavê rexneyê bîne ber çavê bîner, bikim.

Li gorî zincîrediramayên ku telvîzyona WAR berhemtîne, çî diramaya komîdî, civakî û keltûrî, mîna zincîreyên Xelo

û Celo, Tehil û Şêrîn, Sinor û Tax û Ax, em li berdem pirojeyê berhemînana diramayeke Kurdî girêdayî civat, keltûr û pirsgirêkên civata Kurdî ne, û heger wisa berdewam bike dê wirde wirde civata Kurdî bixine jêr bandora diramayekê ku ji berhemê huner, hunermend û bi pereyên Kurdî be. Têzanîn ku diramaya Tirkî, Erebi û Hindî li Kurdistanê û dibe ku li deverê bigiştî baladest e, lê mirov dikare bêje ku, meydan li Kurdistanê li berdem wan xalî bû, lê niha dikare bêje nema xalî ye, û heger bînerê Kurd bixwaze li diramayeke Kurdî binere dikare, û babetên cuda û heta radeyekê li gorî zewq û heza xwe bibîne.


Diramaya Tehil û Şêrîn ku berhemînana WARTV, Prodîser Omer Tofi, Çîrok û Sînyaro Seîd Mehmûd û bilehingiya her yek ji Sêrwan Koyê, Zozan Xizir, Karwan Cercîs, hunermendê hêja Miwefeq Reşîd, Heyder Bamirnê, Qedrî Şero, Fexredîn Taha û hejmareke din ji hunermendên Kurdistanê, diramayeke civakî ye, nêzikî mijar û babetên hestiyar ên civaka Kurdî ya serdemyane ye, babetên wek karê jinê, şeweyên hele yên bikaranîna mobayil û entirnetê, kêşe û girtên saxlemî û kêşeyên nûrîngehên taybet û hikûmî, babetên parastina jîngeha Kurdistanê û heta bi arîşeyên

jiyana di komelgehên niştecibûnê li bajaran, bi şeweyekî hunerî ciwan, ku ne kêmi diramaya Erebi û Tirkî ye.

Di vê serdemê de dirama çekê zor karîger e di dest welatên cîhanê de, bi vî çekî dikarin derbasî mal û mêşkê her mirovekî bibin, welatek dikare welatekî din bi rêka dirama dagîr bike, bêyî ku pêwîstiya wî bi tevgera leşgerî û derbaskirina sînoran hebe. Welatên ku heta niha Kurdistanê dagîr dikin vê hêzê baş nasdikin, herwisa baş dizanin bê çawa vê hêzê jibo berjewendiyên xwe, û li dijî çand, keltûr û zîmanê Kurdî bikarbînin.

Lewma dibînim ku gereke û erke hemû aliyên hikûmî û ehlî birijd vê mijarê berbiçav bigrin û bi hemû şiyânên xwe alîkariya hunerê û hunermendan bikin, jibo bikaribin diramayeke pêşkeftî berhembînin, herwiha ez ferz dibînim ku kenalekî taybet bi dirama û sînemaya Kurdî hebe, herwisa divê aliyên hikûmî û kompaniyên taybet kar bikin da ku bazarê ji berhemên diramaya Kurdî re peyda bike, destpêkê bazara navxweyî, piştê jî li Kurdistanê û dawî dê bikaribe cihê xwe di nav bazara herêmî û cîhanî de ji bibîne, ev yek fakterê serekî ye jibo mayîn, pêşkeftin û parastina zîman û çanda Kurdî ye.

Keça Kurd im



Emel Hesen

Keça Kurd im pozbilind im
Bi Şahê Barzan serbilind im
Gewr û rend û çavpling im
Mîna Çiya Şêr û Find im

Xweragir im û Rexit hilgir im
Li her warî ez Agir im
Çeka Leyla ez hilgir im
Mêrg û Geliya ez sorgul im

Kesk û sor û Ala zer im
Li azadiyê ez diger im
Ez li ver im û venager im
Ta mafê xwe ez wergir im

Ez pênuşa Keça Kurd im
Dibistana têkoşer im
Tekoşîa Kurdperwer im
Gertîgihan ez serewr im

Ez Agir im û qed na mir im
Ji vê dozê venager im
Ez Şoreş û Raperîn im
Kilê Çavê Şoreşger im

Ez jiyana jiyane me
Pêşmergeya vê alê me
Ez tîrêja vê rojê me
Cangoriya vê axê me

Sal û zîman derbas dibin
Sozê didim ez serbaz bim
Ez Leyla û partîzan bim
Ser rêbaz Barzanî bim